

| | | | | | | |
|--|-------------------------------------|-----|-----|-----|-----|----|
| Pêşgotin : | ... | ... | ... | ... | ... | 2 |
| Birûska serxweşkirinê | ... | ... | ... | ... | ... | 3 |
| Lêkolîn: | | | | | | |
| - Em zimanê Kurdî binasin | Enistîtuya Kurdî ya stenbolê | | | | | 4 |
| - Têbînin li derbarê hin mijarên rêzmanî ... | Rozad Elî | | | | | 11 |
| Gotar : | | | | | | |
| - Yaşar Kemal | Reşoyê Pîrê | | | | | 15 |
| Wêje: | | | | | | |
| - Gotina min di festîvala Feqeyê Teyrab de ... | Derwêşê Xalib | | | | | 25 |
| - Li gel Dara Sawêrên Tî | Reşd Baravî | | | | | 28 |
| Huner: | | | | | | |
| - Hunermendê Kurdperwer Cemîl Horo | Arif Tislorî | | | | | 31 |
| Helbest: | | | | | | |
| - Helbestvanê Kurd Simoyê Şemo | Serdarê Bedirxan | | | | | 34 |
| - Wey pêximberê evînê | Nehrî Goranî | | | | | 34 |
| - Elenda jîn û eşqê | Merwan Berekat | | | | | 36 |
| - Çar kurtehelbestên Çîrokî | Dr. Ebdilmecîd Şêxo | | | | | 37 |
| - Bibore | E. Tislorî | | | | | 39 |
| - Pêlên <u>Deriya Sipî</u> | Reşid Baravî | | | | | 40 |
| Kelepûr : | | | | | | |
| - Keçka Kafiroş Monelîzeya Kurdistanê | | | | | | 41 |
| - Ji gotinên bapîran | | | | | | 43 |
| Tendurustî: | | | | | | |
| - Kulbûna Kezeba Reş Cureya ((B)) | Bijîşkê PIRSÊ | | | | | 44 |
| Hin têbîn | Memê Alan | | | | | 45 |
| Lêborîn | | | | | | 48 |

kovarapirs@yahoo. Com Buha (50) L.S

Li şûna pêşgotinê...

Mirovê nemir heval Sma'îl Umer

Li roja 18.10.2010an dilê mirovê hêja, siyasetvanê dilfereh, hişmend û pêdar, rewşenbîrê Kurd, serokê partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûryê, mamoste Sma'îl Umer ji lêdanê rawestî.

Kek sma'îl ji destpêka xortaniya xwe de dilsozê gelê xwe bû, xemxwarê rewşên wî yên siyasî û jiyana wî ya rojane bû. Ew ji destpêka salên şestî de ji sedsala borî, tev refên xebatkarên gelê xwe bû, û cihê xwe di nav tevgera Kurdî de li sûryê girt.

Li dema ku bû pîrpirsyarê yekem ji Partîya Yekîtiya re, û ew barê giran hilgirt, û ta roja ku dilê xwe ji lêdanê rawestî, ango li dirêjîya dora bîst salan, ew mînakê zor hêja bû ji siyasetmedariyê cihgirtî, hêmin, dûrbîn, pêdar û aştiyane re...

Kek Sma'îl ji heval û dostên xwe re nimûneya dilsozî û dilgermiya mirovanî bû. Guhê wî û dilê wî herdem û ji her kesekî re vekirî bû, pîr guh dida xwendin û nivîsandinê, û bi sedan gotarên wî yên siyasî û ramanî di gelek rojnameyan de hatine belavkirin.

Ew bi ser rewşenbîr û nivîskaran de, nemaze yên ku bi zimanê Kurdî dinivîsandin, pîr dilgerm bû, rewşên wan ji hemî waran de dişopand, li kêleka wan disekinî û her gav ji wan re alîkar û piştgir bû.

Kovara me PIRS û nivîskerên wê bi xwe jî, ji her aliyekî dîndarê wî û hevalên partiya wî ne, em wî tiştî ji bîr nakin, û emê di rêça pêkanîna azadiya raman û baweriyên de, riya ku mamoste Sma'îl serê xwe da ser de bimeşin, û tê de bi ser kevin jî.

Birastî... Mamoste Sma'îl Umer ji her aliyekî de mirovekî gewre û gernas bû, hevaltî û rêbertiya wî cihê dilxweşî û serbilindiyê bû.

Erê valahiya ku Mamoste Sma'îl Umer li şûna xwe hişt, demeke dirêj jê re divê ku were dagirtin, lê belê gelê ku mîna wî ji nav peyda bûye, hîç ne stewart, û lawên wî dê bi pêdarî û dilêrî di bin barê xwe de rabin.

Bi boneya jidestdana xebatkarê gewre mamoste Sma'îl Umer serokê Partîya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûryê, li ser navê desteya kovara PIRSê ev birûska Serxwaşkirinê ji heval û malbata wî hat şandin:

((Bi xemgîniyeke zor giran me nûçeya jidestana mamosteyê hêja kek Sma'îl Umer bihîst. Birastî.. Ew nûçeya reş pir ji nişkave hat, koçkirina kek Sma'îl qet ne di bîr û balan de bû, û ji kûraniya dil wijdên de em êşandin.



Jidastana biracane hêja Sma'îl ne tenê di warê siyasî de ziyaneke mezin e, ew di warê çand û rewşenbiriye de jî, nemaze di warê çand û rewşenbiriya Kurdî de, ziyaneke zor mezin û pir giran e.

Em û kovara me PIRS di warê çap, belavkirin û pişgiriye de dêndarê şexsê kek Sma'îl û hevalên partiya wî Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Suryê ne, xemxwariya wî ji bo derçûna kovara me ya bi zimanê dayîkê nayê jibîrkin.

Birastî.. Yê ku kek Sma'îl nas dikir, zane ku kesên mîna wî di nav me de pir hindik in, salixên kesane yê payebilind û nirxdar ku li ba wî hebûn, bi hêsanî û bi hev re li ba kesekî peyda nabin.

Kek Sma'îl ta dawiya jiyana xwe ji doza azadiya gelê xwe yê Kurd re, û ji tevahiya nofên gelê Sûryê re dilsaoz bû; Ew rêberkî bîr fereh, pêdar, dilsoz, xwedî hêviyên mirovane û mezin, û bi ser her tiştî de jî rewşenbîr û zana bû.

Bêguman.. Hêviyên wî di pêkanîna azadiyê de, ne xewn in û dê di demekê zû de pêk werin. Kek Sma'îl dê herdem di bal û dilê me de be, û emê şopa xebata wî bi dilgermî bajon.

Bila serê gelê Kurd û hemî berketiyên ciwanemerg kek Sma'îl Umer xweş be)).

Sernivîserê Kovara PIRS – Efrîn ... 19.10.2010

EM
ZIMANÊ KURDÎ BINASIN
(2/4)

Amadekar:
Hasan Kaya.. Zana Farqînî.. Samî Tan
Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê
www.enstituyakurdi.org

Di nav zimanên cîhanê de
zimanê Kurdî

Zimanê Kurdî, her wekî ku gelek zimanzan û kurdzanan jî destnîşan kiriye, ji malbata zimanê îndo-ewropî ye. Di nav vê malbatê de Kurdî, ji koma zimanê Îranî ye. Ji nav koma zimanê îranî jî, li milê bakurê rojava dikeve. Niha em navên hin zimanên ku di koma zimanê Îranî de cih digirin bidin:

Farisî, Kurdî, belûcî, osetî, yexnûbî, peştoyî, pamirî û hwd.

Ji bo ku cihê zimanê Kurdî xweş diyar û zelal bibe, em bala xwe berdin ser senifandina zimanan. Zimanzan, wek adet zimanan

ji du aliyên ve disenifînin û vê yekê li gorî şêwe û binyadê dikin.

a) Ji aliyê şêweyê ve ziman

Zimanzan ji aliyê şêweyê (morfolojiyê) ve zimanan li sê koman parve dikin:

1) Zimanên yek-kîteyî: Zimanên çîn û tîbetê gişt bi vî rengî ne.

2) Zimanên pêvekî: Tirkî û macarî pêvekî ne.

3) Zimanên tewangbar: Zimanên îndo-ewropî û samiyî tewangbar in.

Ji ber ku zimanê Kurdî jî, zimanekî tewangbar e, divê em li ser tewangbariyê çend tiştan bibêjin. Zimanzan

tewangbariyê wiha rave dikin:
“*Tewang di dema kişandinê de guherîna rayekê (qurm, kok), bi taybetî jî guherîna dengdêrên rayeka lêkerê ye.*”

Ji bo zimanên tewangbar mînaka herî navdar Erebi ye. Di Erebi de dengdar (konsenant, bêdeng) wekî xwe dimînin û bi dengdêrên (vokal, bideng) ku têne serî û dikevîne nava peyvê, bêje pêk tên. Mînak, *ktp* sê dengdar in û bêjeyên *kîtap, mektep, katîp*, hwd. bi guherîna dengdêran pêk tê. Dîsa *chl* sê dengdar in, her wiha bi guherîna dengdêran peyvên mîna, *cahîl, cehele*, çêdibin.

Di Kurdî de cureyên peyvê yên guherbar ditewin ango li gorî peywira ku digirin ser xwe diguherin. Ev yek heta bigihe rayeka lêkerê jî diguhere. Ji bo nimûne lêkera *kirin*, di dema niha de dibe */di-k-im/*, li vê derê jî lêkerê tenê tîpa */k/yê* dimîne. Em nimûneyeke din jî bidin, lêkera *parastin*. Em vê lêkerê bi dorê, li gorî deman bikişînin. Pêşî li gorî dema niha:

ez di-parêz-im

ez: cînavka kesê yekemîn ê yekejimar (ji desteya cînavkên netewandî, xwerû)

di: qertafa dema niha

parêz: qurmê lêkerê (ya fermanî)

im: jî qertafa kesê yekemîn ê yekejimar

Niha jî em li gor dema borî bikişînin: *min parast*

Min: cînavka kesê yekemîn ê yekejimar (ji desteya cînavkên tewandî)

Parast: qurmê lêkerê (ya dema borî)

Wek ku ji mînakan jî xuya dibe, di Kurdî de ne tenê dengdêr her wisa dengdar jî diguhere. Çawa jî lêkera ‘parastin’ê xuya dibe, di çaxê kêşana dema niha de, **de** qurmê lêkerê (parêz) de, */a/* bûye */ê/* û */s/* jî bûye */z/*.

Li aliyê din, di Tirkî de tu car di dema kêşanê de rayeka lêkerê naguhere, her tim wekî xwe dimîne. Çawa ku rayek naguhere her wisa dengdar û dengdêrên wê jî li dengê din naguherin. Mînak, lêkera çûn ‘*gitmek*’ e, koka wê */git/* e, mirov dikare gelek qertafên kişandinê û dariştinê bîne dawiya wê, wekî *gittim*,

gidildi, gidecet, gitmişlerdi û hw.

b) Ji aliyê binyadê ve ziman

Ji aliyê binyadê ve zimanan li pênc komên sereke lêkve dikin:

1) Îndo-Ewropî (îngilîzî, fransîzî, Kurdî, Farisî)

2) Semîtîk (Erebî, îbranî, akadî)

3) Bantû (zimanên başûr û naverasta Afrîkayê)

4) Zimanên Çînî (zimanên çîn û tîbetê)

5) Óral-Altay (fînî, macarî, ûygûrî, Tirkî, moxolî)

Çawa ku me li jorê jî dabû xuyakirin, zimanê Kurdî zimanekî îndo-ewropî ye. Dema mirov bala xwe dide zimanên îndo-ewropî mirov rastî gelek peyvên nêzî hev tê. Ew rewşa hanê ji bo hemû zimanê ku di heman malbat û komê de ne, wisan e. Niha jî ji bo vê yekê em tabloya jêrîn derpêş bikin.

Li ser vê mijarê Minorsky wiha dibêje: “*Kurdî jî wekî Farisî yek ji zimanên rojavayê Îranê ye. Her wekî Andreas, Salamann, O. Mann, Meillet,*

Lent, T. Tedesco jî gotiye, zimanê rojavayê Îranê dibin du bir, bakur û başûr, ew her du bir tevî hev bûne. Digel vê yekê jî, di zimanên îroyîn de gelek tiştên ji hev re biyanî hene, Kurdî û Farisî ji gelek aliyan ve xwedyên taybetiyên serbixwe ne. Ango zimanê Kurdî dikeve birê bakurê rojavayê zimanê îranî.”

Gelek kes, ji ber ku zimanê Kurdî û Farisî xwedyê gelek peyvên hevpar in, zimanê Kurdî wekî zaravayekî Farisî bi nav dikin, lê zimanzanên ku li ser Kurdî xebat kirine vê yekê red dikin. Ligel vê yekê em dîsan dixwazin cudahiyên di navbera Kurdî û Farisî de bidine xuyakirin.

| Kurdî | Îngilîzî | Almanî | Fransîzî | Farisî | Greki |
|--------------|----------|---------|----------|--------|--------|
| Stêr | star | stern | astre | sitare | astron |
| kurt | short | kurz | court | - | - |
| lêv | lip | lippe | levre | leb | |
| dilop | drop | tropfen | - | - | - |
| nav | name | name | nom | name | - |
| no/na | no | nein | non | - | - |
| tu | - | du | tu/te | - | - |
| nû/niwe | new | neu | neu | - | - |
| neh | nine | neun | neuf | | |
| dot | douther | - | - | - | - |
| Bira/birader | brother | - | - | brader | - |

Cudahiyên di navbera Kurdî

û Farisî de

Zimanê Kurdî û faris ji ber ku di heman komê de ne, ji hin aliyan ve nêzî hev in. Ji ber vê yekê, hin dewletên ku li ser kurdan serwer in, hebûna kurdan napejirînin û zimanê wan wek zimanekî col (têkilhev) û xerabûyî yê Farisî bi nav dikin. Pê namînin û vê yekê ji baweriyên xwe yên siyasî û perspektîfên xwe yên paqijkirina etnîkî re dikin kerese (malzeme). Ev îstismara hanê, ji awira zanistî gelekî dûr e. Lewma em pêwîst dibînin ku cudahiyên van her du zimanan bi awayekî serkî be jî, li ber çavan raxin.

Çendî ku ev her du ziman nêzî hev bin, ew qas jî, ji hev cihê ne û her yek ji wan zimanekî serbixwe ye.

Kurdî zimanekî zayendî ye, ango nêr û mêtî tê de heye, lê ev yek di Farisî de tune. Di Kurdî de (di kurmancî û kirmanckî/zazakî de) du kom cînavk hene, lê di Farisî de em rastî tiştekî wiha nayên. Ev her du komên cînavkên di Kurdî de, di lêkerên gerguhêz de ji hev cuda têne bikaranîn, ango zimanê Kurdî zimanekî ergatîv e. Mînak ji bo zaravayê kurmancî:

Min nan xwar.

Ez nênan (nanî) dixwim.

Mînak ji bo zaravayê kirmancî:

Min nan werd

Ez nanî wena

Her wiha di zimanê Kurdî de nêr û mêtî di cînavkên kesîn û nîşandanê de jî heye, lê belê di Farisî de tiştekî wiha nîn e. Ji bilî vê yekê, di Kurdî de du kom cînavkên nîşandanê hene, Farisî ne xwedî taybetiyeke wiha ye.

Em dikarin gelek cihêtiyên van her du zimanan destnîşan û amaje bikin. Lê belê ya baş ew e ku em gotinê bidin Vladimir Minorsky bê ka ew der barê van her du zimanan de çi dibêje. Kurdnas V. Minorsky dide xuyakirin ku,

zimanê Kurdî û Farisî ji hev cihê ne û her yek ji wan, zimanekî serbixwe ye. Mînorsky aşkera dike ku di navbera Kurdî û Farisî de pênc cudahiyan girîng hene:

1) Denganî: Denganiya (fonetîka) Kurdî ji ya Farisî cihê ye.

2) Guherîna deng: Peyvên ku ji heman kokê tên jî, ji aliyê deng ve guherîneke mezin di wan de çêbûye.

3) Cudahiya şeklan: Ji cînavkan bigire heta bi kêşan û çevana lêkeran, ji qertafên cînavkên xwedaniyê bigire heta bi qedaneka navdêran û hwd cudahî heye.

4) Cudahiya peyvsaziyê.

5) Cudahiya peyvan.

Zaravayên Kurdî

Li ser mijara zaravayên Kurdî gelek nêrînen ji hev cihê hene. Nemaze hin kesên ku naxwazin hebûna kurdan û zimanê wan bipejirînin, hemû devokên Kurdî wekî zarava nîşan didin û hin caran zarava jî wekî ziman didine xuyakirin. Lê ev kêşe û arîşeya

hanê, ji mêj ve ji hêla zimanzan û kurdnasan ve hatiye ronîkirin.

Hê di sedsala 16'an de Şerefxanê Bedlîsî di berhema xwe ya navdar *Şerefnameyê* de zaravayên Kurdî wiha rêz dike:

1) Kurmanc. 2) Lor. 3)
Kelhûr. 4) Goran.

Li gorî G. Girvinli ku di salên 1836-37'an de li ser etnografiya Kurdî hinek lêkolîn kirine, zimanê Kurdî dibe du beş: kurdiya jêrîn û kurdiya jorîn.

Peter Lerch (1857-58), Kurdî li pênc zaravayan dabeş dibe: zaza, kurmancî, kelhûrî, gûranî û lûrî...

Oscar Mann, Kurdî wekî kurdiya rojava, rojhilat û başûr dibe sê beş. Mann, goranî û zazakî wekî Kurdî napejirîne.

E. B. Soane, di berhema xwe ya bi navê *Grammar of Kurmanji or Kurdish Langauge* (1913) de, Kurdî li sê beşan parve dibe: kurmanciya jorîn, kurmanciya jêrîn, lorîzaza (hewramî û goranî).

Ziya Gökalp, di xebata xwe ya bi navê *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler* de, Kurdî wek pênc zarava hildaye dest: kurmanc, zaza, soran, goran û lor. Gökalp daye zanîn ku, ev gişt zarava ji kurdiya qedîm derçûne.

Dr. Mac Kenzie, Kurdî dibe sê kom: koma bakur, koma navîn û koma başûr.

Cemal Nebez jî Kurdî dibe çar beş: kurdiya bakur, kurdiya navîn, kurdiya başûr, goranî-zazayî.

Alaedîn Secadî, di berhema xwe ya bi navê *Destûr û Ferhengî Zimanî Kurdî, Erebî û Farisî* de, zimanê Kurdî dibe du beş: kurmanciya behdînî û soranî.

Li gorî Dr. Kemal Fuad zimanê Kurdî çar zarava ne: 1) kurdiya rojava (jorîn). 2) kurdiya rojhilat (jêrîn). 3) kurdiya başûr. 4) kurdiya zazakî-goranî.

Fuat Heme Xurşîd, di berhema xwe ya bi navê *Zimanî Kurdî, Dabeşbûnî Cografyayî Dîyalêktekanîy* de, zimanê Kurdî wiha dabeş dibe: 1) kurmanciya bakur. 2) kurmanciya navîn. 3) kurmanciya başûr. 4) goranî.

Emîr Hesênîpûr, di xebata xwe ya bi navê *National and Language In Kurdistan* (1918-1985) zimanê Kurdî dibe çar zarava: kurmancî, koranî, hewramî, kîrmanşanî.

Ji xebatên van zimanzan jî diyar dibe ku, bi piranî ew xwediyê wê raman û hizrê ne, ku di Kurdî de çar zarava hene:

1) kurmancî (kirdaskî).

2)

kurmanciyaverast (soranî)

3) kirmanckî (kirdkî, zazakî-goranî). 4) loranî.

Kurmanciya bakur (kurmancî) û kurmanciya başûr (soranî) du zaravayên sereke ne. Ev her du zarava wekî zaravayên ku xwediyê wêjeyeke nivîskî ne, têne pejirandin. Van demên dawîn, zaravayê kirmanckî (dimilkî-zazakî) jî hêdî hêdî ber bi nivîskîbûnê ve gavan diavêje.

Di nav zaravayên Kurdî de zaravayê ku herî zêde pê tê axaftin kurmancî ye. Kurmancî li hemû deverên ku kurd lê dijîn pê tê axaftin.

Li Tirkiyeyê bi tenê Kurmancî û zazakî hene. Ji bilî çend deverên mîna Anatoliya Navîn û Qerejdaxê, ku şêxbizinî lê dijîn. Ev jî devoka soranî ye.

Tevliheviya di warê zaravayan de pirî caran jî, ji ber navlêkirinê tê. Wek nimûne, ji bo kurmanciya bakur, li başûr behdînî û li rojhilat jî şikakî tê gotin. Her wiha ji bo zaravayê kurmanciya jêrîn jî, kurmanciya xwarû, soranî tê gotin. Heman tevlihevî di warên dimilkî de jî, zaravên wekî kirdkî, kirmanckî, dimilî, dêrsimkî, sobê hwd, têne bikaranîn. Ji bo hewramî jî navê goranî tê bikaranîn. Wekî ji mînakên jorîn jî xuya dibe, navên ku hemû lêkolîner li ser li hev dikin, navên mîna Kurdî, kurmancî, kirmanckî û kirdkî ne. Navên din tev navên herêm û êl û eşîran in.

Devokên zaravayên Kurdî

Kesên ku naxwazin zimanê Kurdî wek zimanekî serbixwe bipejirînin, axaftina her bajarî, heta ya her gundî wekî devok,

heta hin caran jî wekî zarava bi nav dikin. Çawa ku di hemû zimanan de zarava û devok hene, wisa di zimanê Kurdî de

jî hene. Em ji bîr nekin ku standardî di zimanê nivîskî de heye, lê di zimanê devkî de, bêyî mudaxele û statûya siyasî, zimanê standard pêk nayê.

Ehmedê Xanî (sedsala 17an), di berhema xwe ya navdar Mem û Zînê de, 11 zaravayên kurmancî li ser sê devokên bingehîn parve kiriye. Em vê peyt û tespîta wî bi malikeke ji şahesera wî nîşan bidin:

Bohtî û mehmedî û silvî

Hin la'l û hinik ji zêr û zîvî.

Mirov dikare vê gotina Ehmedê Xanî ji bo devokê kurmancî wekî bingeh bigire. Bi awayekî giştî lêkolîner, devokên zaravayên din jî wiha rêz dikin:

Kurmanciya naverast (**soranî**):
silêmanî, mukrî, sineyî.

Kirmanckî (**zazakî**):

devoka Dêrsimê û devoka Siwêregê.

Çend Têbîn li Derbarê Hin Mijarên Rêzmanî

Rozad Elî

Zimanzanekî nasraw di kovara ((Gulîstan)) hejmar 31 de, gotarek bi navnîşana ((Gotina " lêker " bi wateya " verb, kar " ne durust e!)) weşandi bû. Wî tê de goti bû, gotina " **Lêker** " ya ku Mîr Celadet bi kar aniye, wateya (Fi'il) nade, û bêjeya " **kar** " li şûna bêjeya " lêker" bi kar aniye. Û bêjeya ((**kara**)) jî bi wateya bêjeya Erebî "Fa'êl" û Înglîzî " subject " datîne, ew wê jî li şûna bêjeya "**Kirar**" a Mîr Celadet dixebitîne.

Di vî warî de, zimanzanîne din jî hene, ew jî pêkol dikin, da têrmên ku Mîr Celadet di warê rêzmanê de bi kar anîne bidin alîkî, û hine din li şûna wan bafrînin û bixebtînin.

Me berê nêrîna xwe li ser van têrman ((lêker, kirar û kar, kara)) di kovara "Pirs" de belavkiri bû, lê ji ber giringiya mijarê, emê dîsa wan nivîsarên xwe bibîr wînin, û li ser

mijarine rêzmanî yen din jî baxivin..

A. Têrma "Lêker"

Di baweriya me de, dema ku Mîr Celadet têrma " lêker" bi wateya (fi'il, verb) bi kar aniye, wî zanî ew çî bêje ye, û çî wateyê dide.

Wek em dizanin, bêjeya "lêker" ji koka xwe de "bêjeke bargiranî" ye, û ji sê bêjeyan hatiye darijtin:

Li + (wê / wî) + ker = Lêker

Ango:

1. Li+(wê,wî)=Lê: Ji têkilhevbûna dacek "li", û cinavên nîşankirinê "wî, wê" hatiye darijtin. Yanê "li+wê/wî=lê", ev têkilhevbûna jî di zimanê Kurdî de tiştêkî naskirî ye.

2. Ker: Ji koka xwe de " kir " e. Radera wê " kirin " e . Kirin bi xwe jî lêkereke alîkar e, li paş bêjeyan tê, û bêjene nû pê çê dibin. Lê bi

demê re, gava ku bi dawîya bêjeyan ketiye, carina rengê xwe guhertiye û şeweyê "ker" standiye. Bi gelemperî "ker" bi dawîya navdêran dikeve, û rengdêrên endamtî û taybetiyê çê dike. Wek: Karker, xebatker... Darijtina bêjeya lêker jî di hundurê vê rêzanê de ye. Ji xwe, tîpa wê "k" bi rengê xwe yê nerim tê bilêvkirin.

Yanê bêjeya "lêker" rewş, mebest û wateya tiştêkî, karekî dide nasîn, ku hikariya xwe, bandora xwe çûye ser kesekî, tiştêkî...din .

Di baweriya me de "kar" û "lêker" tucarî nabin yek, ne di wateyê de, ne jî di rîzmanê de. Di zimanên din de jî wiha ye. Ango bejeya "kar" rêçika xwe teng e, gava mirov dirame, hez dike, dimre, ew bûyer bi wateya "lêker" tînasîn, ne bi wateya "kar", jî ber ku wek nimûne, ramandin, evîndarî û mirin ticarî ne bûne kar, ne kar in, lê belê ew bi tîrm û bêjeya "lêker – (li wê kir)" tîn kirin, û baştir tîne tîgîhîştin.

B. Tîrma "Kara"

Mîna ku xuya dibe, **KARA** bêjeke pêkhatî ye, û ji du beşan pêk tê: "kar" + parkî "a", wek bêjeyên "beza (bez + a), zana (zan + a)"...hwd.

Wekî ku nas e, parkî "a" salixa kesekî yan tiştêkî dide, ango ew ji bîngeha xwe de, tenê salixa ew bêjeya ku bi dawîya wê ketiye dide. Yanê ew kesê "beza", tenê salixeke wî heye, ew jî (bez) e, û wilo (zana), û hwd. Lê belê, bêjeyêke mîna bêjeya (kara), ne di nivîsandinê de, ne jî di axaftinê ticarî bi kar ne hatiye, û ne jî me bîhîstiye.

Eger em li dora bêjeya **KIRAR** a ku Mîr Celadet bi kar aniye bigerin, emê bibînin, ku ew jî bêjeke pêkhatî ye, û ji bêjeya "kir" (ji radera kirin) û parkîta "ar" lêk hatiye (kir + ar). "ar" jî parkîteke bêjesazkar e, û ji bo darijtina rewş, salix û xwediyê salixekê bi kar tê. Ango, bêjeya "kîrar", bi tevahî, li gor wateya xwe, vê mebestê diyar dike, ango: (Xwediyê kirinekê), ew kirin jî çî dibe bila bibe.

Ji şiroveyên jorin xuya dibe, ku bêjeyên mîna : kar, bez,

zan... tenê wateya tiştên sînorkirî û naskirî didin nasîn. Lê belê bêjeya "kir", xudî wateyeke fereh e, ango em kanin bi alîkariya wê, hemî kar, bez, zanebûn, raman, hest û tiştên din jî bidin zanîn û nasîn û wan diyar jî bikin, ji ber ku bêjeya (kir) ji bingeha xwe de, lêkereke alîkar e, û ji stûnên darijtina peyvên Kurdî yê ji hemî wate û rengan e.

Di baweriya me de, pêdvî tineye, ku em têrmine din e nû di warê rêzmanê de bi kar wînin, ji ber ku ên hene bes dikin, û belkî zêde bin jî.

D. Pirtikên (dê , ê):

Piraniya zimanzanên Kurdî dupat kirine, ku ji bo darijtina teşeya demên " wêbê ", tenê nîşandek heye û bikar tê, ew jî " dê " ye. Di raweya hevoka dema wêbê de, ew kî bi tevahî, yekser li paş kirarê tê danîn. Eger kirar navdêrek be, " dê " cihê û serbixwe tê nivîsandin, lê eger kirar cinavek be, " dê " tîpa "d" ji dest dide, û wek " ê " dimîne û ligel cinavê mîna yek bêjeyê tê nivîsandin û bilêvkin.

Nimûne:

Eger kirar navdêr be: Azad **dê** were.

Eger kirar cinav be: Ewê were.

Lê hin zimanzanên me dibêjin, ji bo darijtina raweya wêbê du nîşandek hene: ((**DÊ** û **Ê**)), ango ew "Ê" jî mîna nîşandekê darijtina dema wêbê dibîne, û wê jî cihê li paş cinavan dinivîse, wek: (Ew **ê** were).

Ez bawer dikim, eger em di vê mijarê de li ser rêzanên ku berê hene herin, dê rastir be. Ango em alava "dê" tenê, wek nîşandekê dema wêbê bibînin û bi kar wînin, û bi cinavan re jî wek "ê" bi dawiya wan ve binivîsin.

E. Dubarekirina du tîpên dengar ên mîna hev di bêjeyekê de:

Hin nivîskar, du tîpên dengdar ên mîna hev di bêjekê de li dû hev dubare dikin.

Mîna ku em dizanin Mîr Celadet û piraniya zimanzanên me, wê yekê rast nabînin. Ji bilî wê, tiştê ku di wan nivîsaran de bala me dikêşîne, ew e, ku ew tenê tîpa " r " dubare dikin, mîna di bêjeya "kirrîn " de. Lê mîna ku em

dizanin, ji bilî tîpa " r " çar tîpên Kurdî yên "çêwîdeng " ên din jî hene, ew jî du dangan didin, ew jî ev in: (ç, p, t, k). Û dema ku tîpa " r " dubare bibe, gerek em her çar tîpên din jî ji bîr nekin, ew jî bi wê pîvanê werin birin û di bêjeyan de werin dûbarekirin.

Li demên pêş, pêşniyareke din jî hebû, belkî hîn jî heye, digot: Ji bo naskirina tîpên çêwîdeng di rengê sert de, gereke nîşandekê li ser wan were dînin.

Wek em dibînin, dema ku em pêşniyarekê ji van her duyan bibin, û her tîpeke çêwîdeng di rewşa sert de ducarkî binivîsin, yan jî nîşandekê li ser dînin, em bawer dikim, pêdvî tineye ku em bêjin rewşa bêje û nivîsîna Kurdî dê çawa bibe!. Çinkî, di her bêjeke Kurdî de, eger du tîpên çêwîdeng tine bin, misoker yek dê hebe. Ango, wê hîngê, bêjeya ku ji sê tîpan pêk tê, dê bibe çar tîpî, û ya ji çar tîpan çê dibe, dê bibe pênc û şeş tîpî û hwd!!.. yan jî li gor pêşniyara din, emê ji bilî kumikan û nîşandekan li ser bêjeyan nebînin.

Ji bo ku em bêtir vê babetê şirove bikin, emê zimanê Erebi wek mînak bibin.

Di nivîsîna Erebi de, dubarekirina tîpan bi du şêweyan tê kirin:

Yek: Ducarkirina nivîsandina tîpekê. Ew jî ji bo tîpên ku ducarkî tên bilêvkin re tê bikaranîn. Wek: كرر، خطط

Du: Danîna nîşandeka sertkirinê " ـ " li ser tîpan. Ew jî ji bo tîpên "sert" bi kar tê. Mîna: عبدالفتاح جر

Gelo! Di nivîsa Erebi de, kîjan tîp ducarkî tene nivîsandin? Bersiv: Tenê ew tîpên ku ducarkî, û li dû hev ji nav lêvan derdikevin, ew tenê ducarkî tên nivîsandin. Mîna nimûneyên ku me li jor anîne: Kerere كرر , Xetete خطط .

Lê tîpên ku tenê bi şêweyên "sert" tên bilêvkin, ango mîna tîpa "ت" di navê "Ebdilfetah" de, û ji bo nasandina wan, tenê nîşandeka sertkirinê " ـ " datînin ser wê tîpê. Wek: Fere فرّ , Kere كرّ .

Ji xwe, wekî ku em tev dizanin, piştî ku zimanê Erebi baş hat xeftandin, û teşeyên bêjeyên wê jî hatin naskirin û

liezberkirin, pêdvî bikaranîna nişandeka sertkirinê nema, û li roja îro, ew ji bilî di deqên olî de netê bikaranîn.

Pirsa me ev e: Dema ku zimanê Kurdî jî baş were xebtandin, û formên bêjeyên wê baş werin naskirin û liezberkirin, wê hîngê, dê pêdvî bi dubarekirina tîpên cêwîdeng bimîne? Ew yek dê ji zimanê me re nebe giranî? Û emê li xwe poşman nebin, û venegerin ser şopa Mîr Celadet?.

F. Ev hevoka jêrin di nivîseke zimanzanekî de hati bû:

((Mebesta min ew e, ku Ez vî karê rêzder û aloz ji hemû hêlan ve **tevbidim**)):

Wek em dibînin, lêkera hevokê bi vê darêjê hatiye "Tevbidim".

Mîna ku em dizanin, radera evê lêkerê "tevdan" e. Ango, ew radereke pêkhatiye û ji koka xwe de wiha hatiye darijtin: (tev+ dan). Mîna ku em dizanin jî, lêkerên pêkhatî, di raweyên lêkerên fermanî, bilanî û hekînî de, ango di ew

lêkrên ku bi berlêkera "bi" tîn veguhastin, berlêkera " bi " netê xebtandin, û tenê nişana kesan a wê raweyê bi paş lêkerê dikeve. Loma jî, ji bo lêkera "tevdan" a ku di wê hevokê de hatiye, darêja wê ya rêzmanî ya rast "**tevdim**" e, û gerek e wilo were nivîsandin. Çinkî raweyên mîna: Bila ez **hilbidim**, ez **rabikevim**, ez **rûbibim**... û hwd, ne di peyvê de, ne jî di nivîsandina Kurmancî de tinene.

G. Ev hevok jî di lêkolîneke zimanzanekî de hatiye: ((Me hev **nedinasî**)). Mîna ku xuya dibe, ev hevok di raweya neyînî de hatiye.

Wek di gelek jêderên rêzmanî de, û li ba Mîr Celadet-Lîsko jî hatiye, nişandeka neyîniyê di raweyên demên borî de bi lêkerê nakeve, û cida tê nivîsandin, nemaze jî eger berlêker "di" li pêş lêkerê hebe. Ango gerek e hevok wiha were nivîsandin: (Me hev ne dinasî). Ji ber ku daçeka neyîniyê (ne) û berlêker (di) di lêkerê de, bi hev re, û bi hev ve netên nivîsandin.

Yaşar Kemal

Amedekar : Reşoyê Pîrê

Navê bavê Yaşar Kemal e, Kemal kurê Sadiqê Gokçelî ye, navê diya Yaşar jî Nîgar e.

Di şerê cîhanê yê yekem de, Kurdistan dibe meydana şer.

Herêma Wanê ji hêla

Rûsan ve tê

dagêrkirin. Ji tirsê wî

şerî re, Sadiqê

Gokçelî di sala 1915

an de, wek gelek

malan, ji Wanê

goçberî rojavayê

Tirkîyê dibe, û li herêma

Çukurovayê – gundê Hemîtê

bi cî û war dibe. Li wî gundî,

tenê mala wan Kurd bû, Kemal

li gundê Hemîtê, li sala 1923an

ji dayîk dibe.

Di pênc saliya wî de, bavê

wî li ber çavên wî tê kuştin.

Kemal di bin hukarî û tirsê wê

bûyerê de, çend salan ziman lê

nagere û nikane peyva xwe

rasterast bike (Lal dibe). Piştî

kuştina bavê wî, apê wî Tahir

bi diya wî re dizewice. Kemal

li ber destên diya xwe mezin

dibe û hînê ziman, gendêş û

folkilora Kurdî dibe.

Hîn bûyera

kuştina bavê Kemêl

di serê wî de

digeriya, xalê wî,

qeralê serê çiyar,

çeteyê bi nav û deng,

tê kuştin. Ev bûyer jî

wî pir dêşîne. Piştî

wê bûyerê, kemal rastî

bûyereke din jî tê, di wê

bûyerê de çavê xwe yê rastê

winda dike.

Y.Kemal, di sala 1951 an

de, berê xwe dide Stembolê, li

wir bi cî û war dibe. Xebata


edebî berdewam dike û di

rojname Cumhuriyetê de

dixebite. Yaşar kemal cara

yekê wek rojnemevan diçe

Kurdistanê. Rewşa Kurdan, bi



pênûsa xwe dîke nûçe û rapor, û di rojnaman de diweşîne û rewşa wan bi sedhezaran xwendvan dinasîne.

Hukariya bûyerên jorîn, di hersê romanên Yaşar (Çivîka Baranê, Deriyê Kelê û Dengê Xwînê) de diyar û balkêş in.

Y. Kemal ne tenê li Tirkîyê, belê li cîhanê jî, weke romanvîsekî navdar û naskirî tê zanîn. Ew ne tenê weke romanivîs tê nasîn, ew di hemî cureyên nivîsandinê de jî hoste û mamoste ye.

Berhemên Y.Kemal bêtirî 40 pirtûkên cûrbecûr in, çêrok, evsan, serpehatî, şano û bêtirî 20an jî roman in. Bêtirî 30 berhemên wî, bi 30 zimanî hatine wergerandin û li seranserî cîhanê hatine belavkirin. Hin berhemên wî, li Îraqê bi zimanê Kurdî jî derçûne. Û herwiha, ew xwedî roleke zor girîng e, di pêşxistana hunera rojhilata navîn û bi taybetî ye Kurd e ye.

Y. Kemal, ta nuha pir xelat û nîşanên navnetewî wergirtine. Di sala 1991an de, wek hunermendê dewletê li Tirkîyê hate pejrandin. Lê, ji ber kêmasiyên demokrasî û tunebûna mafê mirovatîyê li Tirkîyê, wî nîşan nepejrand û şûnve vejerand. Di sala 1993an de, ew wek endamêkî di akadîmiya cîhanê de li Firansa tê pejrandin.

Pirtûka xwe ya yekemîn di sala 1943 an de, bi navê (**Agitlar**) hatiye weşandin, ev pirtûk weke berevokê stranên şînê hatiye zanîn. Romana pêşîn ya Y.Kemal a bi navê (**İnce Memed**) Memedok – Memedê jar - bû. Ev roman li seranserî cîhanê tê xwendin.

Y. Kemal çareserkirina doza Kurdan li Tirkîyê, di nav xet û sînorên mafên mirovatîyê de dibîne. Ew di wî warî de wiha dibêje "*ta pîrsa Kurdan li Tirkîyê neyê çareserkirin, mirov nikane qala demokrasîyê bike, çareserkirina vê pîrsê, pîvaneke demokrasîye, nezanên me,*

bêhişên me vê yekê fêm nakin. Ew dixwazin bi metodên leşkerî, bi darê zorê koka Kurdan bînin, ew çawa dikainin koka panzdeh milyon mirov bînin, mêzeke her der Kurdîti ye). Lewre jî nêrînên xwe ji berpirsiyarên dewletê re dişîne, stubariya wan dide ber çavên wan û bi zimanekî zelal ji wan re dibêje, ku hûn nikanin li pêşberî mirovatiyê rawestin û mafê Kurdan ên mirovatî bin pê bikin.

Y. Kemal di 30-4-1992 an de, nivîsareke dirêj, wek name, ji serok komara Tirkîyê T. Ozal re rêdike, û nêrîn û çarserkirina pîrsa Kurdî li Tirkîyê diyar dike. Ev name rojnama " **Aydinlik** " li ser du beşan, di rojên 2 û 3an de ji heyva şeşan ji 1993an diweşîne.

Ew di naveroka wê nivîsarê de li ser pîrsa Kurdî weha dibêje : *(Pîrsa Kurdî, pîrsa demoqrasîbûna Tirkîyê ye. Kurd ji mafên mirovane bê par kirine. Tu li welatê xwe nêzîkî panzdeh*

milyon mirov ji hemî mafên mirovatiyê bê par bihêle û paşê rabî, li pêşberî cîhanê bisekine û bêjî : Ezê ji welatê xwe re demoqrasiyê li dar xînim. Ev bi xwe xopandina mirovan e û dereweke mezin e. Mirovatî navê demoqrasîya me – Li Tirkîyê – faşîzma sergirtî, an demoqrasîya Asiya bi nav kiriye. Welatekî bixwaze ji qonaxekê derbasî qonaxeke din bibe, rîya pêşîn demoqrasî ye, Ji ber, mafên mirovatiyê yekpar in. Li tirkîyê, mirovên ji wan mafan bêpar mane kî ne ? Ew Kurdên ku nêzîkî panzdeh milyonan e. Ev her du millet – Tirk, Kurd – wek goşt û neynûk in, di nav hev de mazin bûne).

Di heyva Çirîya paşîn 1992an de, serok komarê Tirkîyê **Torgot Ozal**, ji Yaşar dixwaze ku, nêrînên xwe li ser pîrsa Kurdan bide. Yaşar, gotarek dirêj ji Ozal re dişîne⁽¹⁾ û weha jê re dibêje: *(Ev heye hezar sal ku gelên me bi hev re wek biran dijîn. Mirov çawa dikare teswîr bike, ku bira zimanê birayê xwe bibire?*

Artêşa Tirk dikare Ebdela Ocelan "Apo" serokê tevgera veqetxwazên P. K.K. Ji meydana rake, mirov dikare qira nêzîkî panzdeh milyon jî bîne. Lê belê em di dema mafên mirovî de dijîn û mîletên cîhanê roj bi roj bêtir hurmetê ji mafên bingehîn ên mirovatîyê re nîşan dikin. Şerekî dijî Kurdan dê hin bi hin bibe şerekî dijî ramana navnetewî. Mirov divê xweş bizanibe, ku ev şerê hanê, şerê dijî ramana cîhanê ye û tu carê bi ser nakeve, binêrin çawa Emerîka li Vêtnamê bi bin ket û çî bi serê Sofyetsitanê li Afganistanê hat "

Gava Yaşar ji destlatê bê hêvî dibe, çêroka xwe ya bi navê (biratiya gundî û mar)⁽²⁾ belav dike û di rjonama **Le Monde** ya Firansî, ya bi nav û deng de dubare dike

Naveroka çêroka gelêrî ya bi navê (Biratiya gundî û mar) nivîsiye dibêje: *(Mirov bixwaze, nexwaze, em wesan hatine çêkirin. Erê dema em dixwazin eşkere bikin, ku zordariya li me bûye, ji bîr bikin,*

lê belê hiş û bîra mirovan, van zordestiyan di hundirê xwe de, wek êşeke dijwar dihêlin.)..... (Çareskirina pirsê Kurdî dê rê nede, wekî birîneke nû di wecdanê me de vebe. Çareskirina pirsê Kurdî dê rê nede ku, deqeke reş li eniya Tirkîyê çê bibe û Tirkîyê ji civata medeniyetê dûr keve, Çareke bi rûmet ewqas ne zehmet e. Ew, tenê bi giştî dixwazin bigihên mafên xwe yên mirovî). (Ez dixwazim zimanê wan wek zimanekî bê pejrandin, bi zimanê Kurdî bê xwendin û bidin xewndin, pirtûkên Kurdî bîn çapkirin û weşandin, rado û telvezyonên wan bi Kurdî hebin. Lê belê sagehên Tirk ta Îro jî, ev mafên bingehîn nedane derheqê Kurdaan. Li şûna çareseriyeke bingehîn bibînin, ew van daxwazan bi kurtî dibirin û davêjin alîkî)

Rojnama Firansî **Le Monde**, di 13-7-1993an, di rûpela duwem de, hevpeyvînekê bi yaşar Kemal re diweşîne. Hevpeyvîn li ser rewşa Tirkîyê û Kurdistanê ye. Pirsê ji pirsên rojnamê, li ser

şerê çekdarî yê P.K.K bi destlata Tirkîyê re, kuştina mirovan, wêrankirina gundan dîrxistina gundiyan û H.W. D bû. Eger rojekê çareke siyasê ji vî şerî re bê dîtin, gelo her du millet dê kanibin aşîtiyekê çêkin û li hev bîn. Bersiva Yaşar Kemal weha bû : *(Kurdên Tirkîyê bi xwe ji bo serxwebûneke netewî ber xwe nadin. Ew berî her tiştî dixwazin bibin xwedanê çarenûsa xwe ya bê merc û asteng, bigihên mafên xwe yê mirovî. Armanca şerê çekdarî yê niha, bi xwe ev yeka ye. Tirk, Kurd û gelek kes di vî şerî de dimrin. Eger em bêjin dawiya vî şerê bê, biratiya di navbera milletê Kurd û Tirk de, dê bibe biratîke kûrbirînî û dijwar. Çawa milletên ku xwîn di navbera wan de birije, dê bikaribin ji nû ve bi hev re bijîn? Berî ku, dereng bimîne, pêwîst e dawiya vî şerî bê. Min çend caran, di çapemeniya Tirk de, xwast balê bikişînim ser dijwariya vê xeterê, mirov çiqas tova kîne li dora xwe belav bike, ewqasî jî jiyana bi hev re dê*

zehmet be. Nimûneya şerê Bosne li ber çavên me ye)

Di sala 1992 an de, Y. Kemal Pirtûka xwe ya bi navê " **Agitlar** " diweşîne. Di destpêka vê pirtûkê de, ew bi ferehî li ser stranên şîne radiweste û çêra dewlemendiya folkilora Kurdî dike. Di nav rûpelên vê pirtûkê de, pir stranên şîne cî digrin. Rojnama " **Dûnya-Kitap** " li ser wê pirtûkê, hevpeyvînekê bi wî re diweşîne. Y.Kemal bersivên rjonamê dide. Yek ji pirsên rojnamê, li ser Folkilora Kurdî bû. Y.Kemal weha bersiva wê pirsê dide: "*Koka min Kurd e. Ez li Çukurovayê, gundê Hemîte hatime dinê. Li vî gundî, mala me tenê Kurd bûn. Ez fêrî herdu zimanan bûm. Du zimanê min hene. Lê nuha, ez Kurdî wek Tirkî ewqas nizanîm. Ji bo min, rûbarê dinê wek baxçekî çandî ku ji hezar kulîlkî pêkhatiye. Eger ji vî hezar kulîlkî, yek ji vê dinyaya me kêmbibe, mirovatî renekî xwe yê bedew wenda dike. Folkilora*

Kurdan jî, wek a Tirkan, ji her alî ve dewlemend e.

Di wê bersivê de, Y.Kemal gazî û qîr dike, ku Kurd û Tirk li berhemên xwe yên gelêrî xwedî derkevin û weha dibêje: "*Eger me hemî berhemên gelêrî, yên Tirk û Kurdan berevkirana, me dikarîbû du bedewên bi şeng û şapal, du rengên Anedoliyan pêşkêşî mirovatiyê bikirana. Û alîkariya me dikarîbû bigihîsta çanda cîhanê. Ji ber ku, afrandina mirovatiyê, di çandêke netewî, tendurist û bingehîn re derbas dibe*".

Yaşar Bawerî û nêrînên xwe li ser çand û rewşa Kurdan, di rojnameyên Kurd, Tirk û Ewropa de diweşîne. Li ser çanda Kurda weha dibêje: "*Çanda Kurdî beşek ji çanda mirovatiyê, çanda mirovatiyê baxçekî ji hezarên kulîlikan pêkhatiye. Û êrişa destlatên Tirkiyê li ser çanda Kurdan, çelmisandina kulîkeke wî baxçî ye û çanda cîhanê xizan û jar dike*". Yaşar di nivîsara

xwe ya ji bo kuştina Musa Enter, dîsa nêrînên xe dubare dike û li ser dewlemndiya çanda Kurdî weha dibêje: "*Edebiyeta Kurdan pir dewlemend e stranên şînê, govend çîrok... Folkilora Kurdî jî, wek a Tirk dewlemend e. Dinya wek baxçakî ku ji hezar kulîlkî pêkhatiye. Her kulîlkek reng û bihnekê dide. Ji wan yek kêmbê, çanda cîhanê, reng û bihnekê wenda dike, çanda cîhanê jar û xizan dike. Ev heftê sal e, eger ji çand û zimanê Kurdan re destûr hebe, wê hîngê, her du çand – Kurd, Tirk – wê hevdu dewlemend bikirana, anedoliya me dê bû bûye çanda yek celeb*". Loma jî, Yaşar di nav nivîsarên xwe de, dewlemendî û girîngiya çanda Kurdan berz û diyar dike û bi zimanekî tûj, li hember kesên dixwazin çanda Kurdan tune bikin disekine û wan rûreş dike .

Dostaniya Yaşar Kemal û Musa Enter ji demeke dirêj ve ye. Wî ji bîst û sêsalîya xwe de dinase. Dostaniya wan ta

dawiya jiyana Apê Musa berdewam dike.

Piştî kuştina Musa Enter ji hêla terorên Tirk ve, Y.Kemal Nivîsarekê di der mafê wî de dinivîse. Ev nivîsar rojnama Tirkîyê ya bi nav û deng **Cumhuriyet**, di rojên 26-27ê Sibata 1992 an de diweşîne. Emê hin parçeyên bijarte, ji wê nivîsarê pêşkêş bikin.

" Apê Musa Enter, di rojên reş û tarî de, herdem ronak, hêvîdar û bawermen bû. Civak û mirov, çiqas xerab be, wî herdem quncikekî rind û qenciyeke tê de didît. Nêrîn û gotinên mirovan, li hember wî çiqas ters û sert bana jî, wî bi çavekî nerim lê mêze dikir. Ew bi çanda gelê xwe pir bawermend bû, bi hemî hêza xwe ve, li dijî wendabûna çanda gelê xwe disekinî û didît ku çanda gelê xwe, ji çanda cîhanê re alîkar e. Ev bawerî, ta dawîya jiyana xwe ajot û berdewam kir.. Ji ber baweriyên xwe ve, bi mêranî ber xwe dida. Lewre jî hat kuştin. Kuştîdar, an yê Apê Musa, dane kuştin, Tirkîyê jî xwerin, Anadol

vegerandin gola xwînê. Ew kesan, xerabî û kuştina Tirkîyê dixwazin. Ev karê diktatorên xwîndar in. Tirkîyê, divê neketa devê vê riyê. Em dikevin sedsala Bîst û Yekê, ev leka reş di eniya me de, mirovatî napejrine".

Di vê nivîsarê de, Y.Kemal dîsan dike qêreqêr û banga xwe dike welatparêz û welathezan, daku vê kuştinê ji holê rakin "*Tirkîya û mirovatî, kuştina kevokên aştiyê, wek Musa Enter napejrine, ji ber, evqas sitem û piştî evqas xwînrijandin, lihevkerin pir zor e. Ez di bextê we da me, rê nêzîke, wext heye, ji bo xatirê xwîna yê wek Musa Enter, ji bo xatirê evîna biratiya hezar salan û ji bû berdewamiya biratiya pêşerojê, werin em vî karî çareser bikin, tişteki ewqas dijwar nîne".*

Yaşar Kemal, nivîsara xwe bi van gotinan dawî dike : "*Bi rastî, eger nirov bi qasî Musa Enter, ji welatê xwe hez bike – Eger demoqrasî hebe – emê ji vê astengê derkevin. Ji ber ku, baweriya min gelekî bi Musa*

Enterên vî welatî heye. Çi Tirk û çî Kurd be.

Bila bijî Musayên Enter, Apê Musa "

Rojnama NEWROZ, di hejmara xwe ya yekem - Gulana 1995an de, hevpeyvîna rojnama Firansî ya bi navê " Lîbrasiyon " ya bi Y. Kemal re kirî û rojnama Lubnanî " Elsefîr " wergerandiye zimanê Erebî û wê jî wergerandiye zimanê Kurmancî, em pêşkêş dikin.

.....

" Li dawiya sala 1994an, Y. Kemal di kovara "dêr Şpîgil" (Neynik) a alamanî de, gotarek li ser rewşa Turkiyê belav kir. Wê gotarê pir deng da, wê ûştê jî, encûmana tenahiyê ya dewleta Turkiyê (E.I.D.T) Yaşar Kemal bi gunehê perçekirina Turkiyê gunehbar kir, û ew dan ber dadegehê. Lewre, rojnama "Lîbrasiyon" (Rizgarî) ya Firansî, hevpeyvînek bi wî re kir, û ji ber giringiya wê, rojnama Elsefîr a Libnanî, di 27-1-1995 an de wergera wê, bi Erebî

belavkir. Me jî⁽¹⁾, ew wergerande Kurmancî, û ev in çend pirs û bersivên nivîsvanê Kurd ê gewre Y. Kemal:

- Pirsê Kurdî û tunebûna dîmoqrasiyê li Turkiyê, du kêşeyên kevin in. Çima tu niha li ser wan germbûyî û dinivîsî..?

= *Wêrankirina gundan û valakirina ku bi darê zorê li başûr û rojhilata Anadolê dibe, ez pir êşandim. Ez Kurd im û navçê jî baş nas dikim, ji ber ku, ez bi xwe ji wir im. Dixwazim dawiya vî şerî were û xwînêtin nemîne. Ez hew kanim lorîna, dayîkên şerbazên Turkan û çekdarên Kurdan bibhîsim. Ez wek nivîsvan û hevvelatî me, ew gotara stubariya min şirove dike...*

- E.T.D.T. Li ser wê gotarê dadegeh vekir ?

= *Ew dozger dixwazin min gunehbar bikin, bi carekê ne dûre jî ku min gunehkar bikin, ewên ku Turkiyê nasnakî bi min re dibêjin: "Va ye tu serbest dipeyivî û dinivîsî, ango Turkiyê*

¹ - Wergerandin ji Erebî "Rozad Elî".

welatkî demokrat e”, lê na, ne raste, ez dipeyivim û dinivîsim, lê ez dizanim, ezê bihayê wê bidim... Belkî zîndan be, belkî êşgihandin be û belkî jî, ra mirin be jî... Lê, gotara min tîngîniyeke mezin da, û ji ber wê jî ez ne poşman im.

- Bi ya te be, ev şerê, ku li rojhilat başûrê Turkiyê dibe, çima berdewam e?

= Ji ber ku, mafên Kurdan ji heftê salî de, hatine birin, li başûr rojhilat û li rojhilatê Anadolê, bi miliyonan navê cihên Kurdî hatine guhartin. Ma ne ji mafê bavan e, navên Kurmancî li zaroyên xwe kin?. Eger yek zimanê Turkî baş nizanibe, ji cihên gelemper û dadegehan tê qewtandin. Ji heftê salî de, zoreke hovane li ser zimanê Kurdî û Kurdan heye.

Di warê aborî de, berê jî û hertim, deverên Kurdan perîşan Çavkanî :

1- Kovara Nûdem. Hejmar 7. sal 1993

2 – Ev gotar berî wê daxwazê, di rojnamek Tirkîyê de hatibû weşandin.

3 – ev çêrokeke gelêrî ye, naveroka wê (çawa tu mirina birayê xwe ji bîr nakî, ez jî dûvê xwe yê qut ji bîr ankim)

4 - Rojnama Newrozê. Hejmar 1- Nisan û Gulana 1995an ji weşanên Partiya " Yekîttî ", li Sûriyê.

in, du hezar gund hatine şewtandin, di ser miliyon û nêvek Kurd re neçarbûne, cihên dê û bavên xwe berdin, êşandin bi rengê rêk û pêk dibe. Loma xort bi çiyar dikevin, û dibin şoreşger.

- Ma tu ji koka xwe de Kurdî?

= Belê, ez di malek Kurd e bûme. Pişt re me barkir, em hatin Kîlîkiya, me li mal bi Kurmancî deng ne dikir, û tevî ku bavê min nivîskarê dadgehê û zengîn bû, lê ew bi "Rêzdar Sadiq" bi nav nedibû, bi Sadiqê Kurd bi nav dibû. Di ber zarotî û xortaniya xwe re, min gelek tişt dibihîstin, hîn ew Kurdên dihatin seredana me û bi heftan li mala me diman, li bîra min in. Di destpêka salên pêncî de, gava min dest bi karê rojmanevaniyê, di çarçewa çapemeniyê de kir, ez bi Kemalê Kurd dihatim naskirin.

Li dawiya meha şeşan 2010, li bakurê Kurdistan li bajarê Meksê mehrecaneke taybet li ser nêrîn û felsefeya helbestvanê Kurd yê kevin Feqeyê Teyran li dar ket. Rêzdar Derwêşê Xalib yek ji beşdarên wê bû. Wî jî ev kurte gotin li ser felsefa Feqeyê Teyran li mehrecanê pêşkêş kir.

Gotina min Di festival Feqeyê Teyran de

Derwêşê xalib

Mijara min bi kurtî, têgehiştina klasîkên me ye, nimûne **Feqeyê Teyran** e.

Ji serdema klasîkên me ta roja îro, rewşenbîriya kurdî bi şêwe û naveroka xwe pir hatiye guhertin. Gelek rewîşt, rêbaz, pirs, kêşe û têgehên wê serdemê ji holê rabûne û nema bi kar tên.

Ev rastiyeke ji wan sedeman e, ku hin caran em helbestên klasîkên xwe şaş şîrove dikin, yan nagihêjin encamên ronî û durist.

Yek ji têgehên serekî yên wê serdemê, têgeha XWEDA bû. Ku kiryarên Xweda neçar li gorî pesnê wî ne, loma kiryarên çewt û bêdad, ne kiryarên Xweda ne.

Ya din, astên şîrovekirina Quranê ye; **Ibin Ruşd** vê pirsê zelal dike û encamên wê jî ew e, gotara zaniyar jî pêwîst e, li gorî hişê cemawer be û baweriya wî bi Islamê neçelqîne.

Helbesta **Feqeyê Teyran** "Allah Sehergaha Ezel" nimûneyeke baş e, ku bandora



van têgehan li şeweyê derbirînê diyar bike.

Zêdeyî vê jî, **Ibin Sîna** û **Shrewerdî**, li ser heman babetê nivîsîne, ev jî giringiya van têgehan teqez dikin.

Wek **Ibin Sîna** di helbesta xwe de diyar dike⁽²⁾, ku dema Xweda nefis (derûn, rewan, ruh) afirandin, ji bo fêr bibin, ezmûna jiyânê da pêşiya wan, lê nefis ji ezmûna xwe fêrî tutişî nebû. Naxwe ezmûnek vala, bêhûde û çewt bû. Li gorî saloxên Xwedan ev ne kiriyara wî ye, û kesên bi heyîna vê ezmûnê bawer dikin, kiryarên bêhûde û çewt bi bal Xwedan ve didin, ev jî ne durist e, û ev ezmûn efsaneyek e.

Shrewerdî bersiva **Ibin Sîna** dide⁽³⁾ û dibêje; Ku nefisê xwestiye têkeve vê ezmûnê; Naxwe, ev kiriyara çewt encama biryara nefisê ye. Bi vî rengî **Shrewerdî** nerîna **Ibin Sîna** pûç dike.

² - ((Nameya Balinde)) ya Ibin Sîna.

³ - ((Dîwana Sehrûredî)).

Dûv re, **Feqeyê Teyran** bi hêz derbasî nava vê cengê dibe, û dibêje:

*Ellah sehergaha ezel
ferman dikir sibhan ezel
ruh tê mucerd bê 'emel
anî di dîwana hesab.
hîna jî dibêje:
hêja adem ji 'edemê
xêr û şerê di 'alemê
defter kirin te wê demê
kengî hebû min ixtiyar*

Li vir, **Feqeyê Teyran** pirsra dadmendiya darizandina ruhan radixe, pirsra ezmûnê, civandina ruhan, nivîsandina xêr û gunehan, goya ko yek bûyer in. Heger yek ji wan ne hingufê navê Xwedan be, naxwe ev bûyer ne durist e, û çê nebûye. **Gelek spas.**

Meksê 20 /6 /2010

.. / ..

Ev e tevahiya deqa ew helbesta **Feqeyê Teyran:**

Ellah sehergaha ezel

*Ellah sehergaha ezel
ferman dikir sibhan ezel
ruh tê mucerd bê 'emel
anî di dîwana hesab.
anî ji sehra ya 'edem
hind kafîr û hind muhterem
hemya ji bo gerya qelem
reş kir bi vî terzî kitab
emrê te çû ser lefzê (kun)
mecmu'ê erwañan ji bin
anîne dîwana mezin
ferman te kir wan da xitab
jê kir sual lefza elset
qet yek nebû cuzek di dest
emrê te ew qanûne xest
her çend ku wan neda cewab
hêş ne adem bû beşer e*

*ew mîm û hê 'eksa bê xeber e
baxoî nivîsîn xêr û şer e
defter kirin şer û sewab
hêja adem ji 'edemê
xêr û şerê di 'alemê
defter kirin te wê demê
kengî hebû min ixtiyar
hêja adem qed çu nebû
medhê karê xwe ew bi xwe bû
kengî hebû min ixtiyar
ey xaliqê berê cebar
madih bes e ji vê gotinê
tu destan bernadî ji dinê
her bêje heta mirinê
guh nadinê qed kes çu car.*

(Feqeyê Teyran ... R 126).

Li gel Pirtûka Dara Sawêrên Tî

Nivîsîn : Reşîd Beravî

Di rexneya nûjen de , gava xwendevan bi nêrîneke rexneyî li wêjeyê binêre, divê ji sê koşan de bi hev re binêre, ango (Afrandin) bi sê koşan bi hev re tê nasîn :

Namevan --- û name --- û namebir
Nivîskar---û berhem---û xwendavan

Ev tişt ne bes di hilbestê yan di romanê de, lê di çi rengê wêjeyî de be rast e.

Li gor vê nêrîna rexneyî, û li gor zanîna xwe, dixwazim xwendevan bi dîwana helbestê ya bi navê (*Dara sawêrên tî ya nivîskar Hoşeng Osê, çapa yekem, Şam, 2006*) bidim nasîn .

Di (Dara sawêrên tî) de renekî stiranî xwe li bejna helbestan dipêçe, jê helbesta (Evîndarê Qîza çiyayê Cûdî) derxîn, ji ber ku ev helbest helbesteke destaneyî ye, lê belê kinikiya (kurtbûna) wê nahêle bibe helbesteke dastanî.

Tiştê ku hîştîye ev rengê stiranî xwe li helbestan bipêçe bernavên (ez) û (tu), ev jî li gor nêrîna rexnevanê rûsî yê nûjen "Yorî Lotman" ji ber çi helbesta ku bernavê (ez) yan (tu) tê de hebe, dibe helbesteke stiranî, lê ku bernava (ew) tê de pir be, helbest dibe helbesteke çîrokî yan dastanî.

*- Êşek, xewnek, ramanek li hev tên badan dibin tayê Helbestê, wêneyên helbestê li hev girêdide, helbest jî bi van wêneyan çê dibe û bi serî dibe, helbestvan dibêje:

Dema çavên te dikenin

Hîv xwe vedişêre

Û şev şermiya xwe diçirîne

Ez dilerizim

Diderizim

Dibim keldumana helbesteke

bê xwedî,

Hemû çûkên ji helbesta min.

Koça dawî kiribûn

vedgerin demsala evîna min

û te. (rûpel 38).

Lê di ser vî tiştî re ev êş,
xewn û raman, helbestê di riya
hêviyeke şîn, armanceke hêşin re
siwar dikin, ev şînayî bi kûraniya
xwe û ferehiya xwe ji rengê
deryan hatiye, ji rengê asîmanan
hatiye, ji rengê çavên yara
helbestvan bi xwe hatiye, lewre
helbestvan dibêje:

Ji rojê hez dikim

*Ji ber ku esman dike mîna
çavên te. (rûpel 24)*

Di cihekî din de jî dibêje:

*Ev çavên ku di ezmanê xwe de
çendîn ezman guvaştin, ne biyanî
ne?! (rûpel 67- 68)*

*- Piraniya helbestên (Dara
Sawêrên tî) di asîmanê nûjeniyê
de difirin, ji ber ûşt û dihojen ku
helbest bi wan bi firê dikeve.

Di baweriya min de yek ji van
dihoyan (şarezayî) ye: Di gelek
helbestên berehevokê de şarezayî
xuya dibe, ev şarezayî encama
jiyana helbestvan û bizavtina wî
û paşvegereke zanistî ye,
helbestvan dibêje :

*Her sitêrkek, di himbêza xwe de
pakrewankî dilorîne*

*Tê nas bikî bê Xwedê çendîn
hunermend e û her hunermendek
xwedayek e). (rûpel 7-8).*

Dîsa di helbesta (diwazdeh
şiretên xwînê) de dibêje:

Li her dû cîhanan

Her ku zivistan pêrgî payîza

Temenê te bû

*Şîreta çaran, sê hezar car
bixwîne*

*Û carekê tenê pêk bîne. (rûpel
85)*

*- Ji dihojen nûjeniyê:
Têkiliya di navbera çelengiya
zimên û çelengiya hestên
helbestvan de, çiku helbest bi
xwe ji vê têkiliyê ava dibe, bi
rastî di rexneya nûjen ya cîhanî
de, piştî rêbazên rexneyî yên
nûjen derketin meydanê, çer
navdanîna (helbestmendî) ango
(helbestmandiya zimên) dibe, ev
ne bes di helbestê de, lê di roman
û çîrokê de jî rexne li ser
radiweste, di pir helbestan de, em
dibînin Hoşeng Osê vê têkiliyê bi
rengê çeleng pêk tîne, mînak :
Helbesta (serxeşiya dînbûnê) (du
sitêrk û gîtarek) (evîndarê qîza
çiyayê Cûdî) û (siwarê sîpên

bêcir , di helbesta (du sitêrk û gêtarekê) de dibêje:

*Di buhara bê de û ewê dîsa
koçer vegerin zozana giyanê
te, û xwîna te, ji xwe re bikin
kon
wê çaxê ..
tû min hilgire, û li ser têlên
min
pesnê çavên wan bide,
Belkî dilên wan vê carê, bi te
bişewite
û te bi xwe re bibin. (Rûpel 27)*

*- Ji awayên nûjeniyê dîsa ferehiya aşop û kûraniya wêneyên helbestî.

Ev ferehî û kûranî di pir wêneyan de diyar bibe, mîna gewdekirina tiştên bê liv. Ango vejandina tiştên mirî, di helbesta (Evîndarê qîza çiyayê Cûdî) de dibêje:

*Çemê Gundê me xwîn bû
Ne hogirê Bahozan bû.
Tenê bûkên baranê ji xwe re
direvandin .
Lê, wî ji qîza çiyayê Cûdî hez
dikir
Bi evîna wê welatekî ji
dînbûnê .
Ji tîbûna kendavên wê .*

*Û qebqeba memikên wê re ava
dikir. (rûpel 32- 33)*

*- Piştî xuyakirina ew sê ûştên nûjeniyê, dixwazim çend têbînan xuya bikim:

A- Şirovekirina helbestê ji aliyê Helbestvan ve:

Ev şirovekirin deriyê pirsan li pêş xwendevanan digre, û dihêle helbest bibe helbesteke girtî. Ango helbesteke kilîtîkirî, birastî helbest serê xwe bi nêrînekê, pirsekê radike, em dibînin çawa mistek ax ji paxila hîvê û xunava omîdê heriyekê di pizdana avadarê de çê dikin, ev herî û nêriyek ji xewnan dihêlin azadî bizê, li vir helbest giha çelengiya xwe û bi dawî bû, lê baweriya helbestvan bi helbesta xwe kême, û bi xwendevanan jî tune, lewre dixwaze helbestê şirove bike, dibêje:

*Çav têr ken bibin
zik têr nan bibin
zarok têr bilîzin. (rûpel 10)*

Helbest ne daxuyanek e, yan bernama xebatekê ye, da evan tiştan bêje.

B- Di ser vî tiştî re jî, carna şirovekirin helbestê basko dike û nahêle di asîmana nûjeniyê de bifire, di (Gotina kuştîyekî de) Hoşeng dibêje:

*De bêje, bêje, bêje
Çawa ezê ne kuştîyê te bim .
Lêê..!?*
*Çawa ezê Karibim evîna te veşêrim
Çawa ...! (rûpel 71)*

Di (Mistek pirs) de jî dibêje:
*Ji min pirsîn :
Tu çawa bûyî helbestvan ?!
Min got : Ji ber ku min ji te hez kir . (rûpel 77)*

Dawîkirina helbestê bi vê şirovekirinê û bi hestin wisa serav, dihêlin xwendevan li helbestê binêre ku helbest ya kesekî nûh dest bi helbestê Kiriye.

C- Ez naxwazim helbestên (Dara sawêrên tî) li gor nêrînên xwe binivîsim, lê dixwazim bêjim: Dema helbest bi wêneyên helbestî û hestên çeleng di bin

siya ramanekê, xewn û hêviyekê, yan pîrsekê de ava dibe, carna bi gotinekê jî dikeve û tê kuştin.

Di helbesta (pîrseke sitewr) de helbestvan dibêje :

*Welatek li xwe digeriya
Pakrewanek dît
Jê pirs kir
Ez li kû bûm ?!
Navê Min çi bû ?!
pakrewan got:
Dema min xwîna xwe li ser
xaka te rijand, min got :
Bijî Kurdistan*

Heger helbestvan bigota:

*((Dema min xwîna xwe li ser
xaka te rijand, te xwe dît, û te
xwe nas kir))* dê wêne çeleng ba.

Di dawiyê de ez dibînim ku em bi çavekî rexneyîn li helbesta kurdî ya nûjen binêrin, dê bibînin ku her helbestvanek teybetmendiyêke xwe heye ango her helbestvanek ne dûbare ye ji helbestvanên din re, ev jî di wêjeya kurdî de tiştêkî çeleng e.

Hunermendê Kurdperwer

Cemîl Horo

((1943-1989))

Cemîl Horo stranbêjekî gewre û welatperwer bû. Erê ew tenê pêncî û pênc salan jiya, ew jî temenkî kine, lê digel ew temenê kin de, û digel belengaziyê û destengiyê, wî di warê stranê û parastina kilamên Kurdî de pir xizmet kir.

Cemîl Horo li dîroka 10-3-1943an li gundê Se'rincekê ji devera Bilbilê/Efrînê jidayîk bûye, ango wî di meha adarê de çavên xwe vekirine, belkî wê lomê jî dilê wî herdem bihar bû.

Cemîl di zarotiya xwe de, li mizgeftê li ser destê meleyê gund xwend. Dengê wî di xwendina Quranê de pir xweş bû, û ji wê demê de wî hin stran jî digotin.

Hunermend C.Horo jiyaneke dijwar û bi westan û di tinebûnê de derbas kir, loma jî li pir gundên navçê geriya. Li destpêkê li gundê çolaqa karê meletiyê kir, pişt re li gundên Celemê, Şadêrê,

Miskê Tilsilorê karê cotkariyê kir, û li dawiya jiyana xwe hat li bajarokê Cindirêsê bi cih bû û karê necariyê kir.



Ji bilî wan, ew demke dirêj li bajarê Helebê jî rûnişt, ew li Helebê pir di hunerê de mijûl bû, û bêtir hat naskirin.

C.Horo xudanê dengê zelal bû, bi stranê wî re herikandina kaniyan û xwendina bilbilên çiyayê Girê Mezin diket guhên mirov.

Wî gelek cureyên stranan distira, Folkilorî, evînî, netewî, civakî... di gelek stranên xwe de rewş û sinciyên civakî yên ne baş jî rexne dikirin. Wî di stran û hunera xwe de, herdem rewşa gelê xwe dida ber çavan û di riya doza wî diçû, ji ber wê yekê jî wî gelek asteng û zordarî dîtîn.

Hunermend C.Horo li destpêka salên heftêyî ji sedsala bîstan, ligel koma Efrînê ya

Hunerî xebitî, û gelek aheng pê re li dar xistin, mîna ahenga "Sûq Întac" ya sala 1973an li helebê. Ji bilî wê, ew li Libnanê jî di gelek aheng û mehrecanên hunerî yên Kurdî de bi serkeftî beşdar bû.

Hunermend C.Horo stranên gelêrî û destaneyî bi şeweyekî pir hêja digotin, mîna stranên: Feteħ Beg, Memê Alan, Memê Ewan, Teyar Beg.. Gelek stranên herêmkî û hinek ji afrandina xwe jî distiran, wek: Nayle Can, Delalê Keçikan, Zalim Bavo, Tosino û hwd. Lê strana wî ya navdartir li ser bidardekirin û şehîdkirina Leyle Qasim bû, wî gotin û mûzîka wê bi xwe danîn û bi xwe jî stra.

Cemîl Horo li sala 1971an ligel mala xwe derbas Kurdistana Îraqê bû, û li wir li bajarê Zaxo di sersiya pêşmergan rûnişt, ew dora du salan li wir û paşê vegeŕî Sûryê. Li sala 1975an çû Tirkiyê û li ligel hunermenda Kurd ya navdar Eyşe Şanê çend stranên Kurdî tomarkirin, lê bi sedema ku wî strana Şêx Se'îdê Pîran li wir stra, ew hat girtin û ji Tirkiyê hat bidûrxistin.

Hunermend Cemîl Horo helbestên stranî jî diristin, emê li vir çend malikan jî helbesteke wî ye bi navê "Sê Gul" bêjin:

**Hêdî hêdî daketim nav baxçê gula
Dihat guhê min dengê kevok û
bilbila**

**Qîrên û hawarin agir berdan dila
Hin difirîn, hinekan mil dabûn
mila**

**Ew çi baxçe ye wek bihuşt e
Ji gul, çiçekan û çiçekan tevde
mişte**

**Ji wan gulan sê gul tenê mabûn
Zer û sor û sipî di rêzekê de
mabûn.....**

Hunermend C.Horo salên dawîn ji temenê xwe yê kin li bajarokê Cindirêsê di xizanî û tinebûnê de berbas kir, û piştî keftelefteke dijwar bi nexwaşiya Şêkir re, li roja 20.9.1998an serê xwe danî û li goristana pîrozgeha Henên hat veşartin.

Erê Cemlî bi govdê xwe ji nav miletê xwe çûye, lê ewaz, gotin û dengê wî yê zelal û şêrîn zindî mane û hên jî di ezmanê hunera Kurdî digerin.

A.Tislorî

Helbestvanê Kurd ê navdar Simoyê Şemo

Amadekirina: Serdarê Bedirxan

Simoyê Eliyê Şemo, helbestvanekî Kurd e, ji Sovyetistana berê ye, li sala 1928-an, li gundê ji diyîk bûye. Gund kuta dike û li sala diqedîne û li seranserê û deng.



Kelegerxêda (niha şênavan) Xwendina xwe ya navendî li 1957an bijîşkiyê li Êrîvanê Êrîvanê dibe bijîşkekî bi nav

Sala 1989an, dîwana **Bengî**", bi pêşgotina Kilîrkî çap û belav gurza helbestan bijartiyê:

xwe ya 8an ya bi navê "**Dilê** birêz Wezîrê Eşo bi tîpên dike. Ji wê dîwanê, me ev

*Tu bedew î, ez dizanim,
Tacmehelê zêdetir,
Lê çi mişte min anî,
Wê dilê te venekir.
Tu bedew î, ez zanim,*

*Alem divê wê yekê,
Ax, lê tenê nizanim,
Tu ha mayî bona kê?
1965*

Gerden Sîsê..

*Ax, xizala gerden sîsê,
Avrû tera ne cayîzê,
Jar im, sexîr dinêdî me,
Min ne kene, lavaçî me.
Avrûyê çava berbat kirim,
Bextewar bûm, bêbext kirim,
Perîşan im li deşt û çiya,
Starî kir, min ra dirya.
Ax xizala gerden nûrê,*

*Ewqa nêzik, ewqa dûrê,
Li devlêvê te şekirî,
Tavê gezo qey lê kirî.
Ax xizalê, bê delûl im,
Te û bejnê hêsîr qûl im,
Karxezalê, malê dinê,
Min ra tuyî*

1964

WEY PÊXIMBERÊ EVÎNÊ

Nehrî Goranî

Va kolana

Em hembêz kirin,

Ramosandin

Lê dîlberê

Vê xakê

Hêsirên me dinoşin

Em ji bîr nekirin

Daku

Li vê xakê û kolanan

Em bi hev re nimêj dikin

Ji ber ku

Demên borî,

Yên bê

Te xwe ne xemiland

Bi rengê xwe yî...

Bang kir

Li ser sîngê te

Min çîrokên xwe hêştin

Xewnên xwe ne kuştin

Te bi tena xwe

Xwend û şirove kir

Lê dîlberê

Bila navê te bibînim

Li ser dîwaran nivîsiye

Dê pelê daran biperpirin

Bihar

Li deverên me

Bi gul û sosina dixemile

Tîna biharê

Di paca me re derbas dibe

Qeşa dişive, germ dibe

Li heyva piştî

Bahoz û berfê

Ger dûr be

Ê nêzîk be

Agirê gergîn

Tîrêjên xwe

Di dergehê me re derbas be

Tuyê fîncê bi xwe dî

Li dor te bizivrim

Mîna roj û zemînê

ELENDÂ JÎN Û EŞQÊ

Merwan Berekat

Di siya her gulekê de
Her lalekê de
Her qurnefîlekê de
Û bi şevê jî
Di siya heyvê de
Ez siya te ya pîroz maç dikim
Sura bayê hatina te
Min sermest dike
Dil ..
Can û hiş
Bi hêvanê eşqê dimeyîne
Bi nîgaşan re
Dikenim
Dilîzim û difirim
Di çavên te de
Ferîşteyên keçîniyê
Wêneyê min himbêz dikin
Belê ey elenda eşqê
Eger ...
Di siya pêçema te de
Lêvan serxweş nekim
Jiyan melûl û gêj dimîne
Eger ...
Siya min û te
Dûrî hev dimînin
Hemû gul diçelmisin
Hemû bilbil koçber dibin
Dem radiweste
Û roj ditevize
Ey elenda can

Bese dînokî
Bese xeydokî
Bese semakirin
Di dîlanên rewrewk,
Û leylanan de
Xwe ji siya nediyariyê
Azad bike
Ji pişta hespê dûrîtiyê
Dagere
Ji bin hîzala bêdengiyê
Derkeve
Ewrên evîna te
Meya mayînê dibarînin
Dûrmayîna te ...
Bihuşta dilan dişewtîne
Û ji helbestan
Bêjeyên xweş didize
Li benda te me
were
Were.. ey hêviya berbangên
dil
Hatina te ji min re avdas e
Avdasa eşq û evînê ye
Himbêzkirina te
Nimêja jiyan û mayînê ye
Ey elenda jîn û eşqê .

25 / 1 / 2010 z .

Çar kurte helbestên çêrokî

Dr. Ebdilmecît Sêxo

--- (1) ---

KER

Kerekî min hebû,
min kuda dajot,
wê de diçû,
ez dibirim ser kaniyê,
nav rêz,
ez hildigirtim ta serê Metîn,
di çeman re ez dibirim û tanîm,
bi vî rengî çar demên salê,
me bi hev re
bi rêzdarî derbaz kirin.

Min rojekê jibîr kir,
Kerê xwe avdim,
Zarokên gundê me ,
di wê rojê de,
ji dest zurîna kerê min
XEW NEKIRIN.....!!!

--- (2) ---

MIROV

Azepekî min jî hebû,
ji berbangê ta êvarê cot dikir,
bênderên nok û nîskan tev
herdu jinên xwe dikutan,
kevîrên zeviyên me
bi piştên zarokên xwe paqij dikirin.
Rojekê min ji wan re
Firavîn nebir,
êvarê azepê min hat
li ber lingên min

LIMÊJKIR !!!!

Lênîgrad .. 1985

--- (1) ---

Azadiyê dagrî ,
kevoka min
li ser dara gozê ,
li ber strana kaniya
gundê min ,
bi sirudeke xemgînî
jê pirsî
çimmmmmaa ?


Azadiyê got ,
ez tu kesî
bi qaserî bejna xwe
nabîîîînim.

--- (2) ---

Buharê
rengên xwe
ji xwe çirandin ,
kevoka min dîsan
jê pirsî .
lê te xêreeeeee?

Buharê jî dagrî û got,
dizên rengên min pirrrrrr bûne...

Heleb 15.12. 1996



Bibore

E.Tislorî

Li min bibore
Êdî mebe xunava
Berî nivê şevê
Tuyê pişt re bibî
Seqa...
Geya kulîlk û
Hêviyên min
Dipêçî...
Mebe heyva paş ewran
Reşbûna tariyê...
Mebe gulek kenok
Li eywanan,
Û bîna xwe
Bi ser histiriyan de
Diweşînî... !
Sênca xwe mexemlîne
Bilind mefire
Mebe çerçiya
Şêrînbûna xwe
Li qada ciwanan
Ti bazaran meke
Mebe...
Meke...

Mebe...
Bed me be
ji bedewiya xwe re...
Tu nikanî berbangê
Di xwe de bihelînî
Rondikên xwe
Bi ser dîmê xwe de
Meherkîne...
Ji şorbûnê re ne
birçî me...
Ti soz di navbera
Me de nema
Ezê tîrên evîna te
Ji dilê xwe derînim,
û
Li nav goran
Biçînim...
Bi dilopên xwîna xwe
Naman
ji evîndaran re
Bişînim...

Pêlên (Deriya sipî)

Reşîd Beravî

Di guldana jînê de
Em du çiçek bûn
Bayê evînê li me xist,
Em bişkiwîn
Bihna min bi ser te de bû sîwan
Tu ji toza demê diparistî
Te bihna xwe ji xwe re veşart.
Pepolên tîbûna min
Li dor te diçûn û dihatin
Te bi tirşiya xwe
pepolên min kiş dikir!!
Ez bi ser ahînen xwe de dilukimîm
Min bi tenê kevirên xewneroyan
Didane ser hev
Babilîskên poşmaniyê
kêleqûçên min hildiweşandin

Tu di bîra helbestê de hêviyek
keskî
Nehêle hewrên dîdariyê

Li ber bakurên demê serjê bibin
Pelgên nêrînen me
Di berbangek nêzîk de hêşin hatin
Çira kundê payîzê çavan lê zer
dike ?!

Ev helbesta dawiyê ye
Ji çemelê evêna min
Di bihareke kelegirî de bişkiwî,
Dê serê xwe deyne ser palgehê
Hebûn û nebûnê.
Diho, rûyê me li (Deriya Sipî) bû
Em du semawer bûn,
Li kêleka me dîlanekê dengê solan
Di guhê deryê de dikir zingil
(Baran Kendeş) tine bû,
Lê (Lore Lore) dilê me
Bi pêlan ve girêdide
Û hilda û hilda.

Keça Kafiros..... Monelîzeyya Kurdistanê

Keça Kurdistanê ya zor ciwan, ku di şaristaniya Kurdî de bi "Keça Kafiros" dihat binavkirin, çawa ku "Monelîza" di şaristaniya Ewropî ya nûjen de navdar e, wê jî guhdaneke pir mezin wergirtiye. "Keça Kafiros" keçeke pir şêrîn, balkêş û qeşeng bû, malek ji malên Kurdistanê tinebû ku wêneya wê zor ciwan tê de ne dihat dîtin. Li hin malan, di her odeyekê de wêneke wê bidar dixistin. Ew bibû nimûneya ciwaniyê, û gava ku li Kurdistanê ciwaniya keçekê dihat pesinan din, digotin "qaserî ku ciwan e, Keça Kafiros bi xwe ye!".

"Keça Kafiros" kî ye? Û wênesazê wê kî ye?

Berî wêneya wê ya zor hêja bibe entîkeyeke hunerî ya herdemî, hinekan li ser wê gotiye, ku ew keçek rastînkî ye, û çêrokeke wê ya evsaneyî jî mîna çêrokên "hezar şevî" heye. Navê wê di gelek stranên Kurdî yên



Folklorî de heye û li seranserî Kurdistanê stran li ser dihatin gotin. Ji wan stranbêjan, bilibilê Kurdistanê "Hesen Zîrek" li sala 1950, û Mihemed Ehmed Erbîlî sala 1970, du stranên wî yên pir naskirî hene ciwanî û qeşengiya wê salix dide û dipesine.

Li ser "Keça Kafiros" tê gotin, dema ku Îngilîzan li sala 1918an hêriş birin ser Kurdistanê, hin evser û rêberên leşkerên wan bûn evîndarê wêneya wê û gelek helbest li ser ristin, pişt re ew "dîl" girtin û li balefirê siwar kirin, lê belê ew hîç razî ne bû ku bibe dîl û girtiya wan, û mirin da pêşiya xwe da ku ji talankeran re nebe dîl, loma jî rabû xwe ji belafirê de avêt û mir...

Digel ew bûyera bi êş ku – rast bû yan na- lê wê kela dilê helbestvan û wêjevanan hilda, û xelkê jî vîndarî û pêdarî jê hilanî, û mirov li rojhilat û rojava û li her deverên cîhanê bi dilêrî û qîreta wê mat diman. Para

hunermend û wênesazan jî di wê matmayînê de hebû, wan jî rabû wêneya wê bi şêweyekî afranvanî kişandin, ta bû tabloyeke dîrokî ya zor bi wate, pir belav bû, û "Keça Kafiroş" bû Monelîzeyaya Kurdistanê, û bala wênesazên Îngilîzî û Almanî kişand, û bû tabloyeke cihanî mîna tabloyên "Monelîze" û "Şîva Xwedêyî" û bû tabloyeke sereke di mûzexaneyên hunerî de li **li** Ewropa û Emerîka jî.

Ji xwe "Keça Kurdistanê yan Monelîzeyaya Kurdistanê" li rojhilat jî navdar bû bû, ew li nav Tirkan bi navê "Keça Marmarûçk" dihat nasîn, li nav Eereban jî bi "Fatme" dihat nasîn, li Bexdadê jî navê wê "Keça Mi'îdî" bû. Belê, "Keça Kafiroş" Monelîzeyaya Kurdistanê bû beşek ji şaristaniya cîhanê wêneya wê jî bû entîkeyeke hunerî û mirovanî ye zor hêja. **((wergerandin ji Erebî ji malpera: Peiwar.com))**.

Li Çiyayê Kurmênc- Efrînê jî wêneya "Keça Kafiroş" di piraniya malên Kurdan de hebû, û sîngê malê digirt. Gelek caran keçikan wêneya wê bi deziyên rengîn bi "qenewîç" çê dikrin, û hunera xwe, evîna dilê xwe û xewnên xwe bi ser wêneya wê de

diweşandin, ew ciwantir dikirin, û li cihê herî berz di male de bi dar dixistin. Lê belê navê wê keçê li ba xelkê Ç.Kurmênc "Fetûma Miğribiyê" bû, û dema ku me ji mezinên xwe dipirsî, digotin ((ew keçek e, ji welatê Mexribê ye, dupişk pê dada û hîn nezewicî bû, mir)).

Di baweriya min de, dema digotin ew keç ji "Meğribê" ye, wan navê wî welatî ji strana Kurdî "Memê Alan" bihîsti bû û biri bû. Wek tê zanîn di wê stranê de, pêrî (firîşte) "Zînê" tev textê wê yê xewê radikin û ji welatê "Miğribêyê" dibin li Cizîra Bota li Birca Belek li oda "Memê" datînin. Ango em kanin bêjin, ku ciwanî û qeşengiya "Zînê" û belkî bedewtiya keçikan bi tevahî bi welatê "Zînê" bi "Miğribê" ve dihat girêdan, tewrî ku piraniya şênîyê Kurd yê wê hîngê, nizanîn welatê "Meğrib" li kûderê ye, lê ez bawer dikim, ku wan ji her deverke ku li rojavaya "Cizîra Botan" ba, digotin "Muğrib", ango "Rojava" bi zimanê Erebî. Mirina "Fetûma Miğribiyê" di keçaniya xwe de, bi pêdadana dupişkê, ew jî mirina "Zînê" û bedkarî û xiniziya "Bekoyê 'Ewan" tîne bîra mera. **(Rozad Elî)**.

Kulbûna Kezeba Reş cureya "B"

Bijîşkê Pirsê

Kulbûna kezeba reş cureya B, ji nexaşiyan mirov ên sereke ye. Kesên ku li seranserê cihanê vîrûsa kulbûna kezebê B hilgirtine dora 280 milyon kes e. Tewir hindik ji wan kesan dora 50 milyon kes dê ji ber wê nexaşiye bimrin.

Danasîn:

Sedema kezebkulbûna cureya B vîrûsa kulbûna kezeba reş B ye (HBV).


Jêderên vîrûsê:

Kesên nexaş û hilgirên vîrûsê yên ku hîn ti rûdanên nexaşiye lê diyar nebûne, ew vegirdarên vîrûsê ne.

Rûdan û pêşnişanên nexaşiye:

Rûdanên vîrûsê nexaşiye bi şeweyekî zelal û naskirî rûnadin, piraniya caran ew bi van pêşnişanan diyar dibe: Mirov xarinê kêr dike, zikêseke nenas tê dîtin,

dilxelandin û vereş çê dibe, û pişt re zerik diyar dibe. Belkî ta û germbûneke jî sivik hebe, yan jî qet peyda nebin. Carina êşa movikan û belkî pizikên hûrik jî li ser govde mirovê nexaş derkevin.



Dijwariya nexaşiya HBV têvel e, ew carina ne diyar e, û li mirov xuya nabe, carina jî pir bi lez pêşde diçe, mirov dide bin xwe û mirdar dibe.

Rêjeya mirinê di vîrûsê nexaşiye digihê %1. Ê ew di ber %80 de ji nexaşiya pençeşêra cegerê de jî perpirsyar e.

Rêyên vegirtina ji HBVê:

Vîrûsa kulbûna cegerê B, bi tevahî di hemî ronereyên govde û di destavên mirov de tê dîtin. Lê belê, hatiye dîtin, ku ew tenê bi riya xûn, xazî, avlûsk û şujîya endamên mîhitiya jinan re diçe mirovên din. Ango bi

tevahî HBV bi van şêweyan digihê kesên din:

- Dema kesek toşî ronavên govdeyê kesekî din ku bi vêrûsa HBV keti be, wek di riya xebtandina derziyên hevbeş, firçeya diranan, makîne û şefreyên rîyan, meqesên nênkên û birînên ne pak re. Hêjayî gotinê ye, ew vêrûs di riya perdeyên tenik ên poz û çavan re jî kane derbas govde bibe.

- Birina xûnê ji kesekî nexaş.

- Li rojên berî jidayîkbûnê, ew vêrûs di riya xwînê re ji dayyîka nexaş diçe zarokê di zikê wê de.

- Di rêya gihandina normal û awarte di navbera mêr û jinên nexaş re.

- Gava zarok bi şêweyekî pir nêzîk bi hev re bijîn, dîsa gengaza vegirtina ji hev a HBV di navbera wan de bilind dibe. Ew şêwe sedemeke pir girîng e ji belavbûna HBV re li welatên ku nexaşî lê pir heye.

Dema berî jandariyê:

Ew dem di navbera /45 û 80/ rojê de ye, ango ji roja ku kesek vêrûsê werdigire û ra

dema ku rûdawên nexaşiyê lê xuya dibin dora /2-3/ mehe gerek hene.

Kengî vegirtin gengaz dibe:

Mirov ku vêrûs hilgirti be, kane berî pêşnişanên nexaşiyê lê diyar bibin bi çend heftan, kane vêrûv belav bike. Û ta ku vêrûs di xwîna kesê nexaş de heye, herdem gengaz ku ew kes nexaşiyê belav bike, ew yek jî belkî bi salan dirêj bike .

Çareserkirin:

Hîn dermanekî taybet ji vê nexaşiyê re nehatiye dîtin. Dermanên ku niha peyda dibin tenê vêrûsê radiwestînin û nahêlin zêde bizê û pir bibe, wek vî dermanî: Entêrvêron. Hin derman jî sîstema govde ya li dijî hêrişa vêrûs xort dikin, ew derman jî ev in: Aşle, Globolîna berevaniyê.

Çawahî û karûbarên berevaniya li dijî HBV:

- Kesên ku ji nexaşan ve nêzîk in û pê re dijîn, û kesên ku toşî lêketina derziyên ku guman li ser pakbûna wan heye dibin, gerek e yekser gilobolîna xweparastinê ya taybet ku li dijî HBV ye bibin, û bernama xwevegirtinê ku ji sê carên aşleyan pêk tê bistîne.

- Gerek e hemî şîrmijên nûbûyî ku "Kirdeya Ustiralî" di xûna dayîkên wan de erênî ye (+), di navbera çend katan de piştî bûyîna wan globolîna xweparastina lidijî HBVê bistînin, û danê yekê ji aşleya li dijî HBVê jî bibin.

- Gerek e hemî xûna ku ji kesa tê birin, were analîzekirin, û yên ku "Kirdeya Ustiralî" tê erênî be, were tinekirin.

- Gerek e derziyên lêdanê careke tenê werin xeftandin, û hîç ji hesekî din re bi kar netên.

- Pêwîst e her kesek ji ber xwe ve xwe ji hin tiştan biparêze, wek: Şefreyên rîyan, meqesên nêûkan, derziyên lêdanê û firçeyên diranan ên kesên din bi kar neyîne. Û xwe ji hemî tiştên din yên tirsdar ku me li pêş gotine biparêze, û bi merc û erkên xweparastinê pêbend be.

- Lê tiştê herî giring, gereke her şîrmijek di hefteya yekê de ji temenê wî bi aşleya li dijî HBV were aşlekirin, ew aşle jî li her navendeke tendurustiyê peyda dibe û belaş tê dayîn.

Hin têbîn

Memê Alan

Rêvebiriya kovara pirsê ya rêzdar, min cêwîhejmara Pirsê (45-46) ya Buhar û Havîna 2009 an, mijar bi mijar xwend. Birastî, ez pê pir kêfxweş û serbilind bûm. Ji ber ku , ked û cefayê ku ji aliyê vekît û serastkirina wê de we dîtiye berbiçav bû. Wê lomê jî ez sipasiya we dikim, û herweha serkeftinê jî ji were dixwazim. Lê nayê wê wateyê, ku yekcar çewtî tunebûn. Çewtiya herî mezin û nayê pejrandin, ya ku di mijara mamoste Rozad Elî ya navnîşan "Navên şênewaran li navça Efrînê" de bû. Ezê wê çewtiyê di nimûneyên jêrîn de nîşan bidim:

Ebdela El-Ĥilû, Heleb, El-Ĥemwî, Haj Oğlo, Kurdağî..
H.W.D

Ji nimûneyên jorîn dixuye, ku nivîskarê mijarê, tîpa (Ĥ-Ĝ) li şûna (ح-Ĝ) yên erebî bi kar aniye . Belkî hinên dî jî (x) li şûna (Ĝ) bi kar tînin . Em dizanin jî ev mamosteyên me, li dû şopa nemir Osman Sebrî diçin.

Herweha çewtiyek din jî berbiçav di hin hejmarên pirsê de bi min re derbasbûn, hûnê li min biborin, ku nayê bîra min di kîjan hejmaran de ye. Ew jî ev e: Bikaranîna duberkirina tîpek dengdar di bêjeyekê de, gava ew tîp

guvaştî bête lêvkin, wek: Rastir, kullandin, şiddandin, gullebarandin.

Desteya birêvebirina kovara Pirsê ya rêzdar, di baweriya min de, di karanîna abeya kurdî û rastnivîsê de, gereke şopegirtinek we hebe, ne carê bi şewakî be. Û ton çewtiyên weha pêwîste hûn derbas nekin . Ji ber ku, herdu çewtiyên jorîn, ku min destnîşan kirine, ne çewtine normal in, û ew rêzder in. Ji bo nedurustbûna bikaranîna (Ĥ- Ĝ- X...), tîpên Kurdî yên latînî (31) tîp in, piraniya zimanzan û nivîskaran li ser li hev kirine. Û herweha tevaya şeweyên ragiyandinê yên nivîskî bihîstokî û xwendewarî tenê wan (31) tîpan bi kar tînin. Ne hewceye em wan ji hev re bijmêrin, û vê negirêkiyê bikin girêkek dî li pêş pêvajoya zimanê me.

Herweha nedurustbûna bikaranîna dubarekirina tîpek dengdar, ji ber ku ne li gor qeyd û rêzikên rêzimanê Kurdî ye. Ew rêzika ku dibêje tîpa dengdar û dengdêr di bêjeyekê de li dû hev dubare nabin.

Li dawiyê ez hêvîdar im, ku haya we ji van çewtiyên weha hebe. Ta ku, kovara Pirsê ji xwendevanên xwe re bibe dibistaneke fêrbûnê, ne ku wan wenda bike.

Lêborîn!

Di hejmara PIRSê ya 48an de, gelek gotar, nivîs û birûskên sersaxiyê ku bi boneya koçkirina endamê desteya sernivîsariya kovara me nemir **Rezoyê Osê** ghiştibûn destê me, hatibûn weşandin. Mixabin, bi şaşîtî, birûska li ser navê malbata helbestvanê Kurdê nemir **Cegerxwîn**, ya ku mamosta Kesrayê Cegerxwîn şandibû, ne hati bû belavkirin. Em lêbûrîne dixwazin û li jêr e deqa wê:

JI MALBATA OSÊ RE...

Bi dilekî xemgîn û bi êş û keder me nûçeya reş bi koçkirina nivîskar û lêkolînavan û zimanzanê nemir Rezo Osê bihîst.

Ez binavê malbata Cegerxwîn sersaxiya we dixwazim û bila serê we û zarokên wî, û serê dost û hevalên wî û serê gelê kurd sax be.

Mamoste Rezo her û her wê di bîra me de be û nayê ji bîr kirin.

Xwdê wî bi dilovaniya xwe şa bike û cihê wî bihişt be.

Careke dî bila serê we û serê gelê kurd sax be.

Stokholm 5.3.2010

Malbata Cegerxwîn/ Kesra